infoWelat.com

# RÊYA SERXWEBÛNÊ



## OTONOMIYA TÎROLA BAŞÛR

10



## ŞOREŞA KUBAYÊ

3




4

## YEKEMÎN DEWLETA SERBİXWE YA KOLEYAN



6

## WELATÊ GAL DAXWAZA NAVÊ XWE DIKE



5

## DEWLETBÛNA TANGANYİKAYÊ

# Naverok

**Şoreşa Kubayê 64 al berê bi ser ket**...................................3
*Infowelat*

**Haîtî welatê yekemîn ê koleyan e**........................................4
*Infowelat*

**Tanganyika bu muzakereyan bû xwedî dewlet**................5
*Infowelat*

**Welatê Gal navê xwe yê esil dixwaze** ..............................6
*Infowelat*

**Katalonya dibe xwedî erkên penaberiyê**...........................7
*Infowelat*

**Amerîka gef li sirbên Bosnayê xwar**.................................8
*Infowelat*

**Çalakiya Bostonê gef li rizgariya Amerîkayê vekir**.........9
*Infowelat*

**Otonomiya Tîrola Başûr**.......................................................10
*Necat Ayaz*

## DERBAR

Rêya Serxwebûnê bulteneke mehane ya Infowelat e. Self-determînasyon û bi taybetî jî parastina kurdî mijarên sereke yên vê bultenê ye.

Înfowelat di 2013'an de wekî malpereke tematîk hat damezrandin. Civakên ku xwe bi rê ve dibin, parastina ziman û hemû mijarên derbarê mafên neteweyî de di çarçoveya xebata malperê de cî digirin. Herwiha, nûçe û gotarên di derbarê rewşên jeopolîtîk de û bandora wan a li ser mirovahiyê mijarên din ên malperê ne.

Înfowelat li ser van mijarên speşîfîk xebatê dike:

- Serxwebûn, federalîzm, otonomî û modelên lîberter ên xwerêvebirinê.
- Rola ziman a di têkoşîna neteweyî de û têkiliya wê ya bi nasnameya ziman re, herwiha rê û rêbazên parastina zimanên hatine marjînalkirin.

Li Bakurê Kurdistanê Kurdî pir bi lez ji holê radibe û di vê kontekstê de yek ji armancên Înfowelat, lêxistina defa hawarê ye.

Piraniya naveroka Înfowelat bi Kurdî tê weşandin. Lêbelê, hin hevpeyvîn û nivîsên din bi Îngilîzî di malperê de cî digirin.

Înfowelat malpereke serbixwe ye û têkîliya wê bi tu partî û rêxistinên siyasî re tune ye. Herwiha, malper ne di bin bandora tu hukumet û şîrketan de ye.

infowelat.com
Edîtor: Necat AYAZ
Rûpelsazî: ErdWEB
Redaksiyon:Serhed AŞTÎ
Têkîlî: info@infowelat.com

# ŞOREŞA KUBAYÊ 64 SAL BERÊ BI SER KET




Fidel Castro/ Thoughtco.com

1ê kanûna paşîn 1959 roja Şoreşa Kubayê ye.64 sal berê, di vê rojê de hêzên şoreşger dawî li dîktatoriya Fulgencio Batista anîn.

Batistayê di navbera 1940-44'an de bûbû serokê welêt, di 1952'an de dest danî ser rêvebiriyê. Fidel Castro vê qebûl nekir û bi serhildaneke çekdarî xwest dawî li dîktatoriyê bîne. Lê hêzên serhildêr di êrişa 1953'an a li dijî baregeha Moncada de bi ser neketin. Fidel Castro tevlî çend hevalên xwe hat girtin û 15 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn.

Castro di 1955'an de ji ber reaksiyonên navneteweyî hat berdan. Bi dûv berdanê re, Castro ji bo amadekariya şerê gerîla çû Meksîkayê. Di 1956'an de hêzên şoreşger di bin serokatiya Castro û fermandar Che Guevara û Camillo Cienfuegos de gihîştin Kubayê.

***64 sal berê, di 1ê kanûna paşîn 1959'an de hêzên şoreşger ên Kubayê dawî li dîktatoriya Fulgencio Batista anîn. Batistayê di navbera 1940-44'an de bûbû serokê welêt, di 1952'an de dest danî ser rêvebiriyê.***

## Gerîla artêşa Batista têk bir

Şerê gerîla li çiyayên li rojhilatê Kubayê bi qasî 3 salan dom kir. Di dawiya 1958'an de gerîla dest bi êrişa li dijî bajaran kir.

300 gerîlayên di bin fermandariya Che Guevara de Santa Clarayê rizgar kirin û paşê tevlî hêzeke din berê xwe dan Havanayê.

Di 1ê kanûna paşîn 1959'an de artêşa Batista teslîm bû û di 2yê mehê de gerîlayên Kubayê ketin paytext Havanayê.

## Ambargoya Amerîkayê

Amerîka hukumeta şoreşger nasnekir û di 1961'an de bi hevkariya wê kontrayên li dijî şoreşê êriş birin ser Kubayê.

Çeteyên kontra di vê êrişê de bi ser neketin û piştî vê, Amerîkayê ambargoya aborî li hember Kubayê ragihand.

Digel ambargoya giran jî Kuba di warê avakirina binesaziya dewleta nû de serfiraz bû û bû yek ji dewleta herî bi îstikrar a Amerîkaya Latîn.




Hêzên şoreşger bi keştiya Granmayê gihîştin rojhilatê Kubayê. Paşê, di 1958'an de bi rotaya di ser Santa Clarayê re gerîla ket paytext Havanayê. /Harîte: Wikipedia

# HAITI YEKEMÎN WELATÊ SERBIXWE YÊ KOLEYAN E



Rizgarkirina Crête-à-Pierrot (24ê adarê 1802) /Wêne: Auguste Raffet

***Haiti li cîhanê welatê yekemîn e ku di encama têkoşîna koleyan de hatiye damezrandin. Di 1ê kanûna paşîn 1804'an de serxwebûna Komara Haitiyê hat ragihandin.***

Haiti li cîhanê welatê yekemîn e ku di encama têkoşîna koleyan de hatiye damezrandin. Şerê ji bo azadî û serxwebûnê di 1791'an de bi serhildana koleyan dest pê kir.

Daxwaza naskirina mafên dengdanê ji bo hemû beşên civakê armanca sereke ya serhildanê bû. Fikra civakeke demokratîk, piştî Şoreşa Fransayê di nava Haitiyê de belav bûbû.

Fransaya kolonyal ji bo bingeha serhildanê lawaz bike, di 1792'an de mafê dengdanê da koma wekî "mulatto" tê pênasekirin. Mulatto kesên ku yek ji dêbavên wan ewrûpî û yê din haitiyên afrîkî bûn. Herwiha, kesên ku herdu dêbavên wan tevlîhev bûn jî wekî „mulatto" dihatin binavkirin.

Taktîka Fransayê heta demekê bi ser ket lê di 1802'an de serhildan ji nû ve dest pê kir. Vê carê "mulatto" jî tevlî serok û rêxistinên xwe beşdarî şerê çekdarî bûn.

Hebûna artêşa brîtanî ya li herêma Karayîbê bû faktorekê ji bo serfiraziya şerê azadiyê.

## Artêşa fransî şikestin xwar

Lîderên Haitiyê artêşeke xurt damezrandin û êrişên mezin birin ser hêzên fransî. Napolyon di 1803'an de

***Artêşa fransî di şer de şikestin xwar û ev jî rê li ber serxwebûna girava Haitiyê vekir. Bi damezrandina Komara Haitiyê dîroka kolonyal a 300 sal dom kir, bi dawî bû.***

biryara xwe ya vekişîna ji bakurê Amerîkayê eşkere kir. Artêşa fransî di şer de şikestin xwar û ev jî rê li ber serxwebûna girava Haitiyê vekir.

Di 1ê kanûna paşîn 1804'an de serxwebûna Komara Haitiyê hat ragihandin. Qismeke hêzên fransî heta 1809'an li devereke rojhilatê giravê hebûna xwe dom kirin. Fransa piştî demeke dirêj, di 1825'an de serxwebûna Haitiyê nas kir.

Bi damezrandina Komara Haitiyê dîroka kolonyal a 300 sal dom kir, bi dawî bû.




Harîte: Brasilescola.uol.com.br

# TANGANYIKA BI MUZAKEREYAN BÛ XWEDÎ DEWLET



Serxwebûna Tanganyikayê ji aliyê Julius K. Nyerere ve hat ragihandin. /Foto: Africanleadersmagazine

***Tanganyika ku welatekî li rojhilatê Afrîkayê ye, di 1961an de bû welatekî serbixwe. Berî vê demê, welêt koloniyeke Împaratoriya Brîtanyayê bû.***

9ê kanûna paşîn roja serxwebûna Tanganyikayê ye. Tanganyikaya li rojhilatê Afrîkayê di 1961an de bû welatekî serbixwe.

Berîya vê demê, welêt koloniyeke Împaratoriya Brîtanyayê bû. Brîtanya di 1916'an de piraniya welêt ji Almanyayê bi dest xistibû. Almanya di dawiya sedsala 19. de dest bi dagirkirina vî welatî berhemdar kiribû. Di 1891'an de hukumeta Almanyayê serdestiya xwe ya li ser perav û erdên din ên Tanganyikayê ragihand.

Ev welatê ji aliyê axa xwe ve mezin, bû parçeyeke koloniya Rojhilatê Afrîkaya Alman. Brîtanî piştî têkçûna Almanyayê di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de (1918) bû xwediyê vî welatî. Emperyalîstên brîtanî navê "Tanganyika" li welêt kirin. Sîstema cîhanê di 1922'an de serdestiya brîtanî bi fermî pesend kir.

Di 1946'an de serdestiya Neteweyên Yekbûyî ya li ser Tanganyikayê hat naskirin û ev jî bû gaveke ber bi serxwebûnê.Lê digel vê jî hebûna rêvebiriya Brîtanyayê heta serxwebûnê berdewam kir.

Di vê navberê de, Yekitiya Neteweyî ya Tanganyikayê (TANU) ya di bin rêberiya Julius Nyerere de xebatên xwe yên ji bo self-determînasyonê xurtir kir. Rêvebiriya Brîtanyaya ku nexwest bi aloziyekê re rûbirû bimîne, pêşî li hewldanên Neteweyên Yekbûyî yên ji bo serxwebûnê vekir.


***TANU di 9'ê kanûna 1961'an de serxwebûnê ragihand. Brîtanya serxwebûna Tanganyikayê nas kir û paşê welatê nû bû parçeyeke sîstema heyî ya cîhanê.***

## TANU û serxwebûn

Di van şert û mercên erênî de TANU di 9'ê kanûna 1961'an de serxwebûnê ragihand. Brîtanya serxwebûna Tanganyikayê nas kir û paşê welatê nû bû parçeyeke sîstema heyî ya cîhanê.


Bi dûv vê re, ji bo yekitiya Tanganyika û girava Zanzîbarê hevdîtin dest pê kirin. Muzakere di 1964'an de bi encam bûn û ji bo dewleta hevpar navê "Tanzanya" hat qebûlkirin.

Di heman salê de Komara Yekgirtî ya Tanzanyayê ya serbixwe hat avakirin.




Tanganyika ji bilî Zanzîbarê ji erdên Tanzanyaya îro pêk dihat. Harite: Wikipedia

# WELATÊ GAL NAVÊ XWE YÊ ESIL DIXWAZE



Ala Welatê Gal (Cymru)

***Welatê Gal bi fermî "Wales" û miletê wê jî "Welsh" tê pênasekirin. Welatparêzên Galê daxwaz dikin, ji bo navê welêt peyva bi galî "Cymru" bê bikaranîn.***

***Brîtanya di 1999'an de bi awayekî fermî otonomiya Galê nas kir. Bi pêkhatina statuyê, parlamentoya herêmî Senedd hat avakirin.***

Li Welatê Galê ji bo venasîna fermî ya navê welêt kampanyayekê hat destpêkirin. Bi daxwaznameyekê bang li hukumeta herêmî tê kirin, di dewsa navê bi îngilîzî de navê bi galî bê bikaranîn.

Welatê Gal bi fermî "Wales" û miletê wê jî "Welsh" tê pênasekirin. Welatparêzên Galê daxwaz dikin, ji bo navê welêt peyva bi galî "Cymru" bê bikaranîn. Heta niha 3,500 kes vê daxwaznameyê îmze kirine. Eger ev hejmar heta hezîranê bigihîje 10,000î, Parlamentoya Galê wê ev pêşniyazê gotûbêj bike.

Welatê Galê ji ber serdestiya Brîtanyayê, ji 1282'an û vir ve wekî "Wales" tê binavkirin. Brîtanya 1284'an de Welatê Galê bi tevahî xist bin kontrola xwe.

Beriya vê kampanyayê, navên îngilîzî yên du deverên li Welatê Galê bi yên galî re hatibûn guherandin. Li ser daxwaza welatiyan, navê Snowdania National Park bûbû Eryri National Park. Serfiraziyeke din a di ware parastina navên xwerû de di qada toponomiyê de pêk hatibû. Navê çiyayê herî bilind ê Welatê Gal Snowden hatibû betalkirin û di dewsa wê de navê galî Yr Wyddfa hatibû pejirandin.

## Welatê Gal

Welatê Gal (Cymru) herêmeke xweser a li rojavayê Brîtanyayê ye. Nifûsa Galê di ser 3 milyonî re ye û berfirehbûna wê bi qasî 20 hezar km2 ye.

Li Welatê Galê ligel îngilîzî zimanê galî xwedî statuya fermî ye. Li derdora nîv milyon welatî bi zimanê galî diaxivin.

- Brîtanya di 1999'an de bi awayekî fermî otonomiya Galê nas kir. Bi pêkhatina statuyê, parlamentoya herêmî Senedd hat avakirin û hukumeta Galê dest bi kar kir.




Ciyê Welatê Gal a li Brîtanyayê /Harite:Wales.com

infowelat.com

# KATALONYA DIBE XWEDÎ ERKÊN PENABERIYÊ



Ala Katalonyayê

***Îspanya wê erkên di warê penaberiyê de transferê Katalonyayê bike. Ji bo ev yek pêk were, hukumeta Pedro Sanchez wê pêşniyazqanûnekê bişîne Parlamentoya Îspanyayê.***

***Sekreterê giştî yê Juntsê Jordi Turull jî li ser mijarê axivî û got, Katalonya dixwaze erkên vederkirina (deportkirin) penaberxwazan jî di destên wê de be.***

Îspanya wê erkên di warê penaberiyê de transferê Katalonyayê bike. Ji bo ev yek pêk were, hukumeta Pedro Sanchez wê pêşniyazqanûnekê bişîne Parlamentoya Îspanyayê.

Eger pêşniyazqanûn bê erêkirin wê Katalonya bibe herêma yekemîn a Îspanyayê ya xwedî erkên penaberiyê. Agahiyên derbarê vê mijarê de ji aliyê cîgira yekemîn a hukumeta îspanyol Maria Jesus Montero ve hat ragihandin. Montero got, ji bo dayina detayên derbarê mijarê de hîn gelek zû ye û divê ew mijarê hinek din jî gotûbêj bikin.

Il aliyekî din, wezîra serokatiya Katalonyayê Laura Vilagra ji hukumeta îspanyol xwest, nuqteyên girîng ên peymana bi Juntsê re zelal bike.Transfera erkan ji hukumeta navendî bo hukumetên herêmî di çarçoveya xala 150.2 a Destûra Bingehîn a Îspanyayê de pêk tê.

## Erkên deportkirinê

Sekreterê giştî yê Juntsê Jordi Turull jî li ser mijarê axivî û got, Katalonya dixwaze erkên vederkirina (deportkirin) penaberxwazan jî di destên wê de be.

Turull got, hin penaber 210 caran sûc kirine lê şaredarên katalan nikarin derbarê wan de tiştekî bikin. Erkên di warê penaberiyê de di çarçoveya peymana partiya katalan Juntsê û hukumeta îspanyol de hatibû rojevê.

Partiya Sosyalîst a Karker a Îspanyayê (PSOE) ji bo bikaribe hukumetê ava bike, du meh berê bi Juntsê re li hev kiribû.

Junts di berdêla efûya giştî ya serxwebûnxwazên katalan de, di dengdana Parlamentoya Îspanyayê de destekê dabû PSOEyê.

**Çima erkên penaberiyê girîng e?**

Lîderê katalan Carles Puigdemont di daxuyaniya xwe 5ê îlonê yê li Brukselê ji Îspanyayê daxwaza erkên di warê penaberiyê de kiribû. Puigdemont vê daxwazê ji bo destekê bide hukumeta Sanchez a Îspanyayê wekî şertekî pêşkêş kiribû. Di muzakereyên îspanyol-katalan ên li Brukselê de her du alî ji bo damezrandina hukumetê li hev kiribûn. Paşê, di dengdana ji bo hukumetê ya di Parlamentoya Îspanyayê de 7 wekîlên Juntsê yên katalan dengên xwe dabûn hukumeta PSOE ya Pedro Sanchez.

Rêjeya penaberiyê ya Katalonyayê % 16.2 yê û ev ji hemû herêmên Îspanyayê zêdetir e. Herwiha, heman rêje, bi qasî 2 pûan ji yê herêma Madrîdê zêdetir e. Katalonya diyar dike, ji bo bikaribe meseleya penaberiyê bi rêk û pêk bike, pêdiviya wê bi erk û çavkaniyên diravî heye.

# AMERÎKA GEF LI SIRBÊN BOSNAYÊ XWAR

***Herêma sirban Republika Sirpska salvegera 32. a damezrandina xwe ya berê şerê navxweyî ya Bosnayê pîroz kir.***



FAla herêma Republika Srpskayê

Aramiya li Bosna-Herseke bi kûrbûna nakokiya bi netewperestên sirb re xera dibe. Herêma sirban Republika Sirpska îro salvegera 32. a damezrandina xwe ya berê şerê navxweyî ya Bosnayê pîroz kir. Ev bernameya wekî îşareteke daxwaza veqetîna ji Bosna-Herseke tê qebûlkirin, li hundir û derveyî welêt rastî reaksiyonan hat.

Bi taybetî, Amerîkaya garantorê federalîzma vî welatî ye, îsal reaksiyoneke hişk nîşan da. Du balafirên F-16 ên Amerîkayê bi hinceta beşdariya tetbîqata leşkerî ya bi Artêşa Bosnayê re, li ser bajarên Tuzla û Brčkoyê firiyan. Ev der nêzîkî sînorên Republika Sirpskayê û paytexta wê Banja Luka ye. Lewma jî ev yek wekî gefekê li hemberê rêvebiriya vê herêmê tê qebûlkirin. Ji xwe firîna balafiran ji aliyê Sefaretxaneya Amerîkayê ya Sarajevoyê ve hat piştrastkirin.

Wezaretê di daxuyaniya xwe de got, beşdariya tetbîqatê "nîşaneke berpirsiyên Amerîkayê" ya ji bo yekitiya axa Bosnayê ye. Aliyekî balkêş ê vê bûyerê tevlîbûna hêzên leşkerî yên Republika Sirpskayê ye. Ev yek ji aliyê hukumeta Bosnayê ve bi tundî tê protestokirin. Beşdariya hêzên leşkerî ji aliyê dadgeha destûra bingehîn ve hatibû qedexekirin. Lê digel vê jî hukumeta herêma sirban biryara dadgehê red kir û bi ya xwe kir.

## Ku der e Republika Srspka?

Republika Srpska herêmeke bi qasî 24.000 km² berfireh e û nifûsa wê 1.200.000 e.

Ev herêm di 1992'an de ku sala destpêka şerê navxweyî ya Bosnayê, hatibû avakirin.

***Du balafirên F-16 ên Amerîkayê bi hinceta beşdariya tetbîqata leşkerî ya bi Artêşa Bosnayê re, li ser bajarên Tuzla û Brčkoyê firiyan.***

Serokê herêmê Milorad Dodik e ku li ser xeta netewperestiya sirb polîtîkayê dimeşîne. Dodik di doza xwe de destekê ji serokê Sirbistanê Aleksander Vucic digire.

## Bosna ne welatekî aram e

Bi hilweşîna Yûgoslavyayê re, di navbera her sê miletab de şerekî navxweyî pêk hat. Amerîka û Yekitiya Ewrûpayê di şer de destekê dan kroatan û misilmanên boşnak.

Di şerê navxweyî de zêdetirî 100 hezar kes hatin kuştin û bi milyonan kes terka cîûwarê xwe kirin. Piştî şer, bi navbeynkariya Amerîkayê di navbera nûnerên her sê miletan de Peymana Daytonê hat îmzekirin.

Li welêt sîstemeke federal ku ji herêma sirban û herêma hevpar a boşnak û kroatan pêk dihat hat damezrandin

***Herêma sirban di 1992'an de ku sala destpêka şerê navxweyî ya Bosnayê, hatibû avakirin. Serokê herêmê Milorad Dodik e ku li ser xeta netewperestiya sirb polîtîkayê dimeşîne.***




Herêma sirbên Bosnayê Republika Srpska

# ÇALAKIYA BOSTONÊ DERÎ LI RIZGARIYA AMERÎKAYÊ VEKIR



Partiya Çayê ya Bostonê. Berhema W. D. Cooper's ya di The History of North America, London: E. Newberry, 1789

***Çirûska ewil a şerê rizgariya Amerîkayê bi bûyereke di 16ê kanûna 1773an de qewîmî, dest pê kir. Welatparêzên amerîkî li dijî qanûna Çayê ya Împaratoriya Brîtanyayê çalakiyekê li dar xistin.***

***Parlamentoya Brîtanyayê di 1774'an e Qanûna Tepeserkirinê qebûl kir û xweseriya koloniya Massachusettê betal kir. Koloniyên Amerîkayê bi berxwedanê bersivê dan Brîtanyayê û di 1774'an de Hevgirtina Parzemînê ava kirin.***

Çirûska ewil a şerê rizgariya Amerîkayê bi çalakiyeke di 16ê kanûna pêşîn a 1773an de, pêk hat. Di vê rojê de komeke amerîkî avêtin ser keştiyeke çaybarkirî ya li bajarê Bostonê.


Çalakgerên amerîkî hemû qutîyên çayê yên di keştiyê de avêtin nava deryayê. Armanca vê çalakiya li dijî keştiya brîtanî, Qanûna Çayê ya Împaratoriya Brîtanyayê bû. Brîtanya bi vê qanûnê destûrê dabû, Şîrketa Rojhilatê Hîndistanê bêyî ku bacê bide, çayê bifroşe koloniyên Amerîkayê. Navê vê bûyerê li Amerîkayê wekî "Partiya Çayê" hat dayîn û xebera çalakiyê belavî welêt bû.

Çend roj paşê, keştiyên hatin Philedelphiayê ji ber berxwedana amerîkiyan nekaribûn barê xwe vala bikin û neçar man tevlî barên xwe vegerin Brîtanyayê. Amerîkiyên li Bostonê çalakî kirin, endamên rêxistina Kurên Azadiyê (Sons of Liberty) bûn. Ev rêxistin li 13 koloniyên Amerîkayê li dijî baca Brîtanya ya li ser Amerîkayê ferz dikir, têkoşînê dikir. Brîtanya bi tedbîrên hişk bersivê da çalakiya li dijî bazirganiya wê ya çayê.

## Otonomiya Massachusettê hat betalkirin

Parlamentoya Brîtanyayê di 1774'an e Qanûna Tepeserkirinê qebûl kir û xweseriya koloniya Massachusettê betal kir. Bi heman biryarê, bazirganiya bi bajarê Bostonê re dihat kirin, hat bidawîkirin.

Koloniyên Amerîkayê bi berxwedanê bersivê dan Brîtanyayê û di 1774'an de Hevgirtina Parzemînê ava kirin. Krîz her du aliyan ber bi Şerên Lexington û Concordê ve bir ku di 1775'an de pêk hatin. Bi her du şeran, Şerê Rizgariya Amerîkayê ku wekî Şerê Şoreşgerî ya Amerîkayê jî tê pênasekirin, dest pê kir.



# OTONOMIYA TÎROLA BAŞÛR




Parlamentoya Tîrola Başûr /Wikipedia

**PROFÎL**

***Nifûs***: 530,000 (2018)
***Berfirehbûn***: *7,399.97 km2*
***Ziman***: *Almanî, îtalyanî, ladînî* (% 62.3 *almanî*, % 23.4 *îtalyanî*, % 4.1 *ladînî*)
***Destpêka xweseriyê***: 1948

## Kurtedîrok

Tîrol herêmek li rojhilatê Çiyayên Alp e ku di navbera Awistirya û Îtalyayê de hatiye parvekirin. Tîrola Başûr piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi Îtalyayê ve hatiye girêdayîn û bûye tekane herêma almanîaxêf a vî welatî. Bi dûv hilweşandina rejîma faşîst a Musolînî ya di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, Îtalya bûye rejimeke demokratîk û di 1948'an de ji dewleteke navendîparêz derbasî dewleteke herêmparêz bûye. Di çarçoveya sîstema herêmî ya nû de, ji Tîrola Başûr û parêzgeha Trentîno bi hev re herêmeke xweser a bi navê Trentîno-Tîrola Başûr (Trentîno-Alto Adige) hatiye damezrandin.

Digel binavkirina dewletê wekî dewleteke 'herêmparêz', sîstema polîtîk a îtalyan incax di 1970'an de 15 herêmên xweser ên xwedî hin hêzan damezrandiye. Lê ji bo tîroliyên başûr hêzên heyî têr nekiriye û wan ji bo xweseriyeke xurtir li hember Romayê têkoşîneke berfireh meşandine. Ji ber bêaramiya li herêmê, Awistirya meseleya herêmê biriye Neteweyên Yekbûyî û di 1969'an de bi alîkariya vê rêxistinê di navbera her du dewletan de peymana xweseriyeke xurt a Tîrola Başûr hatiye îmzekirin. Peymana xweseriyê ji 1972'an şûn ve gav bi gav hatiye meşandin û di 1992'an de her du dewlet bi fermî dane zanîn ku meseleya Tîrola Başur hatiye çareserkirin.

***Tîrol herêmek li rojhilatê Çiyayên Alp e ku di navbera Awustirya û Îtalyayê de hatiye parvekirin. Tîrola Başûr piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi Îtalyayê ve hatiye girêdayîn û bûye tekane herêma almanîaxêf a vî welatî.***




Tîrola Başûr tevlî Trentinoyê herêmekê Îtalyayê pêk tîne. /Harîte: Academicaccelerator.com

***1969'an de bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî di navbera Îtalya û Awusturyayê de peymana xweseriya Tîrola Başûr hat îmzekirin. Peymana xweseriyê ji 1972'an şûn ve gav bi gav hat meşandin û di 1992'an de her du dewlet bi fermî dan zanîn, meseleya Tîrola Başur hatiye çareserkirin.***



Tabelayeke li Tîrolê: Tîrola Başûr ne Îtalya ye /Historiek.net

## Statuyên xweseriyê

Bi statuya 1972'an a piştî hevdîtinên dîplomatîk, hêzên Tîrola Başûr hatine berfirehkirin. Bi vê statuyê, duzimanî ji bo rêvebiriya herêmî hat ferzkirin û di sektora aboriya herêmî de kotaya ziman hat diyarkirin. Ji bilî van, hebûna zimanê reto-romans (ladînî) a li herêmê dihat axaftin hat qebûlkirin. Statuya xweseriyê di 2001'an de hat revîzekirin û di 50 mijaran guherîn hatin kirin. Bi vê statuyê, hêzên her du parêzgehên Herêma Xweser a Trentîno-Tîrola Başûr hatin berfirehkirin. Di warê zimanê dayikê, dibistan, duzimanî û kotayên etnîk ên ji bo îstihdamê T. Başûr hêza xwe zêdetir kir. Berevajiya vê, hêzên rêvebiriya Trentîno-T.Başûr hatin kêmkirin.

Aliyê herî balkêş a sîstema T. Başûr kotayên etnîk e ku li ser bingeha duzimaniyê hatiye damezrandin. Hemû karên saziyên fermî yên girêdayî şaredarî, parêzgeh û dewletê li gorî vê rêgeza duzimaniyê tê belavkirin. Her xebatkar ji bo bidestxistina kar dive bi îtalyanî û almanî bizanibe. Helbet ji bo bidestxistina karên li devera axêverên ladînî dijîn ligel du zimanan zanîna ladînî jî pêwîst e. Xebatkerên sîstema edaletê û polîs jî bi vê kotayê tên hiljbijartin. Ev sîstem bi konsensûsê hatiye damezrandin û ji aliyê rêvebiriya T. Başûr an hikumeta Îtalyayê ve nikare bê guherandin. Taybetiyeke din a îstihdama li T. Başûr 'prensîba kotayê ye ku her sê komên ziman li gorî hebûna nifûsa xwe karên heyî bi dest dixin. Ji bo derfeta bidestxistina kar hemû welatiyên T. Başûr divê diyar bikin ku ew endamê kîjan koma ziman in.

***Aliyê herî balkêş a sîstema T. Başûr kotayên etnîk e ku li ser bingeha duzimaniyê hatiye damezrandin. Hemû karên saziyên fermî yên girêdayî şaredarî, parêzgeh û dewletê li gorî vê rêgeza duzimaniyê tê belavkirin.***

## Konsey, hikumet û serokê T. Başûr

Konsey wekî parlamentoya T.Başûr tevdigere û di çarçoveya xweseriyê de xwedî mafên qanûnçêkirinê ye. Konsey ji 35 wekîlên ku ji 5 salan carek li gorî kotaya etnîk tên hilbijartin, pêk tê. Endamên konseyê di heman demê de endamên Konseya Trentîno-T.Başûr in. Konseya herêmî ji bi rêgezên hişk ji aliyê Trentîno û Tîrolê tê pêkanîn û serokatiya wê her 6 mehan carekê dikeve destê parêzgehek. Taybetiyeke konseya T. Başûr ev e ku carinan wekîlên her sê komên ziman dikarin li gorî endamtiya xwe ya koma ziman dengên xwe bidin. Eger komeke ziman di wê qenaetê de be ku pêşnûmaqanûnek mafê wan binpê dike, dikare daxwaza dengdayinek bi rengî bike. Heta ku her sê komên ziman erê nekin pêşnûmaqanûn di konseyê re derbas nabe. Lewma ev dengdayin wekî mafê vetoyê yê komên zimanan dikare bê binavkirin.

Hikumeta T. Başûr ji aliyê konseyê ve tê hilbijartin û ji serokek û cîgirek almanîaxêf, cîgirek îtalîaxêv û wezîran pêk tê. Koma herî biçûk ladîn jî dikare li gorî nifûsa xwe û rêgeza kotayê di hikumetê de ciyê xwe bigire. Hikumet qanûnên ji aliyê konseyê ve tê qebûlkirin tetbîq dike û T.Başûr li hember dewletê û hikumeta navendî temsîl dike.
Serokê T. Başûr ji aliyê konseyê ve tê hilbijartin û ji bo herêmê xwedî roleke girîng e. Ew berpirsê meşandina qanûnên konseyê ne û di heman demê de beşdarê civînên hikumeta îtalyan ên di derbarê T. Başûr de dibe.



Çalakiya ji bo azadiya Tîrola Başûr a 1957'an de /Bas.tirol




Kitêbokên almanî-îtalyanî ya di 50 saliya statuya otonomiya herêmê de hatine weşandin. /Autonomyexperience.org

> ***Konsey wekî parlamentoya T.Başûr tevdigere û di çarçoveya xweseriyê de xwedî mafên qanûnçêkirinê ye. Konsey ji 35 wekîlên ku ji 5 salan carek li gorî kotaya etnîk tên hilbijartin, pêk tê. Endamên konseyê di heman demê de endamên Konseya Trentîno-T.Başûr in.***

## Erkên Tîrola Başûr

Hêzên T. Başûr piranî di warê aborî, civakî û çandî de ne ku hin ji wan ev in:

- Rêvebirina saziyên fermî yên herêmî û xebatkarên wan
- Perwerdeya seretayî ya navîn
- Tenduristî (rêvebirina nexweşxaneyan jî tê de)
- Toponomiya duzimanî li ser hemû erdên herêmê
- Parastin û ewlekariya berhem û qadên dîrokî
- Xweza û çavkaniyên xwezayî
- Plankirina bajar û çolterê
- Çûnûhatin û ragihandina herêmî
- Aboriya herêmî (bo nimûne, çandinî, daristan, masîgirî, tûrîzm)
- Refaha civakî
- Polêsên herêmî

T. Başûr di çarçoveya hêzên xweseriyê de dikare bi serbestî butçeya xwe çêbike. Di warê berhevkirina bacê de hêzên herêmê kêm in lê ji % 90'ê baca ku dewletê li ser erdê wê berhev dike ji T. Başûr re dimîne. Bi Reforma Destûra Bingehîn a Îtalyayê ya di 2001'an de, tevlî herêmên din ên xweser otonomiya fînansî ya T. Başûr jî hat berfirehkirin.

Ji dema damezrandina wê ya di 1948'an û heta aniha xweriya gelekî hatiye xurtkirin. Pêvajoya xurtkirina xweseriya T. Başûr baş nîşan dide ku xweserî pêvajoyeke dînamîk e û li ser daxwaz û xebata aktorên herêmî di nava pêvajoyê de dikare bê kûrkirin. Herwiha sîstema kotaya etnîk ku li ser rêgezên duzimanî û kotaya etnîk a nifûsê hatiye damezrandin mînakeke demokrasiyek herêmî ye. Ev sîstema ku zêdetirî 40 salan bi serfirazî hatiye meşandin, ji aliyê hemû komên etnîk û ziman ên T. Başûr bi dilxweşî hatiye qebûlkirin.

## Siyaseta Tîrola Başûr

Siyaseta civaka almanîaxêv a Tîrola Başûr li ser du partiyên sereke bilind dibe. Ev partî Partiya Gel a Tîrolê (SVP) û Azadiya Tîrola Başûr (STF) ne.

Partiya herî mezin herêmê SVP di li bakurê Îtalyayê hilbijartina ji bo parlamentoya parêzgeha Tîrola Başûr a di cotmehê de dengên xwe kêm kirin.

SVPê encax dikarîbû 34.4 ji % dengan bi dest bixe. Ev jî di diroka vê partiya herêmparêz de bû têkçûna herî mezin a polîtîk. Tişteki balkêş bû ku SVPê li deverên bi zimanê Îtalyanî diaxive dengên xwe parast.

Herçî partiya Süd-Tiroler Freiheit (STF) bû, vê hêza siyasî dengên xwe du qat zêde kir û 10,9 ji % dengan bi dest xist.

Süd-Tiroler Freiheit dixwaze Tîrola Başûr ji Îtalyayê veqete û tevlî Tîrola Bakur a Awusturyayê bibe.

Bi van encamên hilbijartinê, çav li rêye li herêmê hukumeteke koalîsyonê dîsa wê bê damezrandin.

STF dixwaze Tîrola Başûr ji Îtalyayê veqete û tevlî Awusturyayê bibe.